# Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

PDK-S Partiya Demokrata Kurdistan - Sûriya 1957

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (247) | Hezîran / 15-6-2023


## Di Kongreya PDK-S de, Serok Barzanî got :

# Hertim piştgiriya we dikin bo xebateke rasteqîne ya netewî ku xizmeta doza rewa ya gelê Kurd li Sûriyê bike




**Kurdistan**

Kongreya 12emîn ya Partiya Demokrata Kurdistan–Sûriya PDK-S hat lidarxsitin û endamên Komîteya Navendî hatin hilbijartin, herwiha piştre Sekretêr ku Mihemed Ismaîl e ligel endamên Mekteba Siyasî hatin hilbijartin.

Serok Barzanî gotarek di destpêka kongreyê de pêşkêş kiribû, û rola Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya (PDK-S) di şoreşên Eylûl û Gulanê de bilind nirxand û hewlên Leşkerê Roj di şerê li dijî terorîstên DAIŞê de ku bi dehan şehîd pêşkêşî niştimanî kirine, bilind nirxand.

Serok Barzanî di gotara xwe de got: “Ez spasiya we û hemû kesên ku di dema borî û niha de roleke girîng di tevgera rizgariya gelê me de lîstine, dikim. Ji vir ve silav li cemawerê we yên xweragir re dişînim. Silav li kesên ku li welatan koçber bûne û yên li vir li malên xwe ne.

Serok Barzanî hêvî xwest ku rewşek dirust bibe ku bikarin vegerin cihê bav û bapîrên xwe û bi yekdengî rûbirûyê kêşeyan bibin. Her wiha daxwaz ji wan kir ku zêdetir dostanî û hevpeymaniya xwe bihêztir bikin û got: “Ji destpêka bûyerên Sûriyê di sala 2011an de, me bi berdewamî piştgirî da we ku hûn bibin yek û çi biryarê dixwazin bidin.”

Serok Barzanî got jî: “Me piştgirî da hemû aliyan ji bo lidarxistina 3 kongreyan (du li Hewlêrê û yek li Duhokê) ji bo têkoşîna netewî û yekitiya neteweyî, lê mixabin astengî hatin çêkirin. Bêguman rêya têkoşîna gel dirêj e û yên li pêşiya destkeftiyan bibin asteng, dê bacê bidin.

Serok Barzanî di dawiya axaftinên xwe de dubare jî kir: “Em hertim piştgîriya we dikin bo xebateke rasteqîne ya netewî ku xizmeta doza rewa ya gelê Kurd li Sûriyê bike.”


**66 sal ji xebata berdewam** — Rûpel—2

**Jineke Kurd li Efrînê hate kuştin** — Rûpel—3

**Şilêsvîg..Bi beşdariya Komeleya Kurdî-Elmanî Baxçeyê Birêveberiya Koçberan hat danîn** — Rûpel—4

# 66 sal ji xebata berdewam




**Kurdistan**

Partiya Demokrata Kurdistan- Sûriya PDK-S, yek ji mezintirîn partiyên Kurdistana Sûriyê ye û ev partî berdewamiya yekemîn partiya Kurd li Kurdistana Sûriyê bi navê Partiya Demokrata Kurd li Sûriyê. Di nîsana sala 2014an de, kongreya partyên yekîtiya siyasî hat lidarxistin û partiya bi navê “Partiya Demokrata Kurdistan- Sûriya PDK-S” hate damezirandin.

> **66 sal bi ser damezirandina PDK-S re derbas dibin**

Partiya Demokrata Kurdistan- Sûriya PDK-S, ji destpêka damezirandina wê ve û heta niha tekeziyê li ser doza rewa ya gelê Kurd li Sûriyê dike, wek dozeke netewî ji miletekî re ku li ser xaka xwe ya dîrokî dijî. Partiya Demokrata Kurdistan- Sûriya PDK-S, ji sala 1957anve û heta sala 1998 an di nava Tevgera Kurdî li Sûriyê beşdarî çend hilbjartinên Parlemana Sûriyê bûye, lê tevî serkeftina kandîdên wan, lê rejîma Be’is nehiştine ew endam biçne nava parlemantoyê, û tenê carekê kandîdên partiyên Kurd bûne endamên Parlemantoya Sûriyê sala 1990î ku kandîdê partî Kemal Ehmed bû. Partiya Demokrata Kurdistan- Sûriya, yek ji pêkhateyên sereke yê Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS ye, ku piştî Şoreşa Sûriyê di sala 2011an de hatiye damezirandin, herwiha di nava opozîsyona Sûriyê jî roleke wê ya çalak heye, herdem cîgirê serokê Îtîlafa Niştîmaniya Opozîsyona Sûriyê serkirdeyekî PDK-S ye. Herwiha take endamê Kurd di nava Komîteya Nivîsandina Destûrê Sûriyê serkirdeyekî PDK-S ye ku ew jî Kamîran Haco ye. Li ser asta Sûryê, Partiya Demokrata Kurdistan- Sûriya PDK-S beşdarî prosêsa siyasî ya Sûriyê  dike di jêr sîwan biryarên navdewletî û di çarçoveya biryara 2254 ya Encûmena Asayişa navdewletî de, û Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya daxwaza Sûriyeke demokrat, firehalî, sivîl, û nenavendî dike ku mafê hemû pêkhateyan têde parastî be û di nav de mafê gelê Kurd wek pêkhateyeke resen ku li ser xaka xwe ya dîrokî dijî.

> **Tekezî li ser mafê gelê Kurd**

Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya di nava Encûmena Niştîmaniya Kurdî de, tekezî li ser wê yekê dike ku di destûrê Sûriyê de, danpêdan bi nasnameya gelê Kurd ya netewî bê kirin, û doza Kurd wek dozeke niştîmanî were naskrin.

> **Berevanîkirin ji gelê Kurd û doza wî**

Xebata Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya ji wê rastiyê destpê dike ku hebûna gelê Kurd li ser xaka xwe ya dîrokî, ev gel li ser xaka xwe ma di çarçoveya sînorên îdarî û siyasî yên naskirî yên dewleta Sûriyê de ku ji rêkeftinên navdewletî mîna Sykes–Picot sala 1916 û Lozan sala 1923 jidayik bûye, ev sînor li ser miletê me hatine sepandin û ji ber van hemûyan Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya berpirsyaretiya netewî û niştîmanî hildigre.Herwiha dema em behsa vê pariyê dikin pêwîste em rola damezrêner û serkirdeyên wê yên berê ji bîr nekin û di serî de Dr. Dema Nûredîn Zaza dibîne ku rewşa miletê Kurd li Sûriyê xirabe, Kurd ji nijadperestiya partiya Be’is di metirsiyê de ne. Li aliyekî din, Partiya Komunîsta Sûriyê, ya qaşo Internasyonalîst, xwe ji neteweya ereban re kiribû parêzer, lê li dijî Kurdan der diket, hinga doza mafên xwe yên neteweyî dikirin û ew bi şovînîzmê tometbar dikirin. Nûredîn Zaza dinivîse: “Di rewşeke wisa de, min avakirina rêxistineke ku karibe nasnama gelê Kurd biparêze û doza mafê wan yên rewa bike, pêwîst didît. Welatparêzên kevnar, mela, muxtar, û cotaryên sade di pêkanînîna wê projeyê de, pîşta min digirtin û di Hezîrana sala 1957an de, ew xewn pêkhat û Partiya Demokrata Kurd li Sûriyê hate damezirandin”.

# Jineke Kurd li Efrînê hate kuştin



**Bidûvçûn**


Li Efrînê jineke Kurd di mala xwe de ji aliyê komeke dizan ve hate kuştin û piştre agir berdan mala wê. Hejmareke diz ketin mala jina Kurd a bi navê Ofê Şêx Ehemd (40 salî) a li bajarê Efrînê. Piştî ku wan pere û zêrê ku di malê de bûn dizîn, bi kêran li wê jinê dan û kuştin, piştre jî agir berdan malê. Ew jin piştî ku hevjînê wê Henîf Henan Xelîl ji bo kar ji malê derketiye, komeke dizan ketin mala wê, ew kuştin û pere û zêr dizîn, berî derkevin jî agir berdan malê, ta ku tawana xwe veşêrin. Roja 4ê vê mehê jî li bajarê Efrînê, pîrejineke Kurd a 70 salî dema di kolanê re dimeşiya, bi guleyek nerasterast a çekdarên opozîsyona Sûriyê canê xwe jidest da. Çalakvanên Efrînê dibêjin, ji dema dagîrkirina Efrînê di Adara sala 2018an de, ji bo ku xelkê resen ê li Efrînê mayî jî koçber bibin, ji aliyê çekdarên opozisyona Sûriyê yên ser bi Tirkiyê ve rastî haletên kuştin, revandin, dizî û talanê tên.


# Ajanseke Emerîkî raportek li ser revandina zarokan ji aliyê çekdarên ser bi PYD ve belav dike

**Kurdistan-Bidûvçûn**

Di meha derbasbûyî de çekdarên ser bi Partiya Yekîtiya Demoqaratîk PYD ve zarokek bi navê Peyal Eqîl li Kurdistana Sûriyê revandine, û berev serbazgeheke rahênanê birine. Ajansa Associated Press ya Emerîkî ku navenda wê li New Yorkê ye, çîroka vê keçê belav kiriye, û ev doza rastî guhdaneke zêde hatiye di çarçoveya ew zarokên jêr temenê 18 salî li Sûriyê têne revandin, dayika vê zarokê dibêje bê erêkirina wan vê grûpa çekdar keça wê revandine û berev serbazgehekê ve birine. Hemrîn Alûcî dayika Peyal Eqîl ya 13 salî wiha ji vê ajansê re dibêje, keça wê dema vedgerya malê ligel hevalên xwe piştî ezmûna dibistanê, çekdarek ji Tevgera Ciwanên Şoreşger ku rêxistinek ser bi PKK ve ye jê nêzîk bûye û bi hev re derbasî navendeke wê rêxistinê bûne, hevalên Peyla li hêviya wê bûn, lê ew ji wê navendê derneket û nema diyar bû. Hemrîn Alûcî got, ji wê demê û heta niha, wan zaroka xwe nedîtî ye, herwiha dibêje jî wan pêwendî ligel aliyekî peywendîdar kiriye û ji wan re gotine, keça wan tevlî programekî rahênanê bûye ku 45 rojan berdewam dike, û piştre dê zarok ji xwe re hilbijêre ka dê ligel wan di prosêsa serbazkirinê de berdewam be yan dê vegere mala xwe. Hemrîn Alûcî, wisa dibêje"Ti kes ji van dezgeh û aliyên peywendîdar bi wan re alîkar nebûye" Berpirsekî wê rêxistina ser bi PKKê ve ji ajansa Emerîkî re bê navê xwe eşkere bike, wiha dibêje, li gor zanyarî û navên li ber destê wan ne rêxistina wan ev keç revandine. Raporta Associated Press amaje bi revandina zarokekî din dike bi navê Umer El-Hebîb, ajans dibêje, bavê vî kurî bi navê Welîd wêran bûye ji ber windabûna kurê xwe ku temenê wî 15 sal in. Welîd El-Hebîb wiha dibêje, herdem kurê wî jêre digot ezê biçim cihekî, lê di dawiyê çû, û venegerya malê, ev partî zarokan dike çekdar û di destpêkê de red kirin ku ew li pişt vê bûerê ne, lê di jêr fişarê de di dawiyê de danpêdan bi wê yekê kirin ku wan kurê min revandine û tevlî programeke rahênanê bûye. Ev rêxistina ciwanan molet ji rêveberiya PYD wergirtiye, û bi agahdariya wê kar dike. Sala 2019an, Hêzên Sûriya Demokrat HSD rêkeftinek ligel Neteweyên Yekgirtî îmze kir ji bo bidawîanîna diyardeya çekdarkirina zarokan, lê malbatên Kurd li deverê û Nivîsîngeha bi navê parastina zarokan dibêjin ev diyarde berdewam e û bidawî nebûye.









Herwiha Peyvdarê bi navê Hêzên Sûriya Demokrat red kir li ser pirsa çekdarkirina zarokan biaxive. Lê endameke Nivîsîngeha bi navê parastina zarokan got, ew nikarin gelek tiştan di vê derbarê de bikin, tenê ew dikarin li hêviya bersiva grûpên çekdar bimînin, dibêje jî ji destpêka vê salê û heta niha 20 sikala li cem wan hatine tomarkirin û tenê 4 zarok ji malbatên wan re hatine vegerandin.

# Şilêsvîg..Bi beşdariya Komeleya Kurdî-Elmanî Baxçeyê Birêveberiya Koçberan hat danîn







**Kurdistan**

Li bajarê Şilêsvîg (Schleswig), Birêveberiya Koçberan û bi beşdarbûna Komeleya Kurdî-Elmanî (Kurdisch-Deutscher Verein Schleswig-Flensburg, baxçeyekî gulan hate danîn ku biryar e navekî Kurdî li vî Baxçeyî bê kirin. Baxçeyê hevbeş Kurd û Elmanan gul û kulîlkên li gorî seqaya herêmê çandine. Di roja cîhanî ya jîngehê de hem bi amanca parastin û ciwankirina jîngehê, hem jî ji bo têkilya Birêveberiyê digel biyaniyan tako tabloyeke pêkvejiyanê nîşan bidin. Berpirsê navçeya Şilêsvîg Dr. Wolfgang Buschmann (Dr. Volfgang Bûşman) li çalakiyê amade bû. Birêveberê Birêveberiya koçberan Nils Wienke (Nîls Vînkê) kurtegotarek xwend û têde got: "Ez pir kêfxweş im ku bi we re çalakiya çandina kulîlkan dest pê dikim û bi hev re em tiştekî ciwan û rengîn biafirînin. Dawiyê bihar hat û tav dihêle ku xweza dîsa şîn bibe. Gelo çi ji çandiniya kulîlkan bi hev re rêyek ji bo pîrozkirinê çêtir heye?. Em komeke rengîn in, ku ji gelek welat û çandên cuda hatine. Her kes ezmûn û helwesta xwe bi xwe re tîne û ew tiştek e ku ez bilind dinirxînim û rêzê lê digirim. Ji ber ku tenê bi danûstandin û hevdîtinan em dikarin ji hev fêr bibin û bi çandeyê hev dewlemend bikin". Anna Nonkovic, karmenda Rêveberiya Hemahengiyê li Birêveberiya Koçberan li ser çalakiyê wisa axivî:"Ez hatime gazîkirin ji bo em pêk ve li ber deriyê avahiya Birêveberiya Koçberan (Mîma) gulan biçînin, ji bo çalakiyê, me kesên curbicur vexwendin"

Ezîz Xemcivîn, yek ji endamê beşê ragihandina Komleya Kurdî-Elmanî wiha ji Rojnameya Kurdistan re got: "Bi amanca parastina jîngehê û zindîkirina xakê pir giring e çalakiyên wisa bêne kirin, bi taybetî li Kurdistanê û yek ji amanca Komleya Kurdî-Elmanî ku bikare li welat jî piştgiriya çalakiyên zindîkirina jîngehê bike û di sala derbasbûyî de bi rêka Komeleya Kurdî-Elmanî gelek cûreyên gulan li Kurdistanê hatine çandin.

Bajarê Şilêsvîg ne gelekî mezin e, li bakurê Elmanyayê dikeve, di navbera derya bakur û derya Beltîq de ye. Hejmara niştecihên bajêr 24071 kes in. Di navbera Danîmar û Elmanyayê de ye û dadgeha bilind ya Elmanya li vî bajarî ye, derdora du hezar Kurd jî lê dijîn.

## Zimanê Şêrîn



Azad Haco Hemê

Zimanê şêrîn zimanê meye
Sed dilov li gora tebe
dayê te ez anîm dinyê
Ji şîrê te min vexwarî
Bi zimanê te ez hîn bûm
Ser bi berzim bextewerim
Para min jivê gerdûnê
Îro Kurdim bi zimanim
Ev diyarek ji xwedê
Tijî hest û pirr bi wate
Bi gotinan çi navdarî
Dîrok û wêje hate rêsîn
Berxwedana hezar salî
Ber hev bûye bi dest zana
Mîna melayê cezîrî
Ehmed xanî pê parastî
Kultûr û netewa kurdî
Her milet bi zimanê xweye
Xwe bi zimanê xwe dibînî
Ol û oldar netew perest
Ta miriyên wan bi zindî
Zêrevanên zimanên xwe
Bi hêmayê wan avdayî
Tijî kurdo mîna wane
Bi nirxê xwe tu ne kêmî
Xwedî doz û xwedî ale
Mîna çema xwîn rijandî
Zimanê te nasnameye
Ger tunebe tu tuneyî
Pê bi xwîne pê yazîke
Zimanê xelkê bi kêr me nayê dûmahî